

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdêa Sûriye û Libnanê, 15 Ireyên Sûrî; ji bona welatên din 2 Ireyên Ingilîzî. Bihayê Hejmarekê; 15 Qemêrî.

# ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR DR. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Weqîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74-04; Telefona Mala Xwedîyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojant.

## CENG & SIYASET

### DEWRAN

#### Mîna ko em Dixwazin

Kurd dipirsin, gelo halê me wê çawan bibe, didawiya vî serf de em jî bigehin miradê xwe, em jî bibin xwedî dewlet û hikûmet, zaroyên me wê bikarin hebin dibistan û xwendegahên kurdî, û tê de hînf zmanê xwe ê gerîn bibin. Gelo ew wê bikarin bibin xwenda û zana û mîna zaroyên mîletên dinyayê ên din; bi arkariya zanî û hinerên nû û nûjen, serfiraz û bikêrhatî; gelo mehkemeyên kurdî de çêbibin, kitêb, kovar û rojnameyên kurdî di nav bajar û çaristanên kurdî de, de bêne belav kirin, firotin; ala me jî nû ve de bê-te daçikandin ser serê qesr û avahîyan, ordiyên Kurdistanê wê hebîn; heke carekî din çerêk çêbû, emê bikarin mîna mîletên hevalbend ên mezin û biçûk, ji bona azadî û serbestiya welat û cihanê, xwîna xwe birejînin, û bibin mîletek ji yê nobetdarê silh û aştî û xweşt û rahetiya dinyayê?

Belê kurd wan tiştan dipirsin: Cewaba vê pirsê ev e: em çilo dixwazin, Kurdistan wîlo çêbibe; jê ne bêtir û ne jî kêmtir.

Qenci an xerabiya Kurdistanê di destê me de ye; erê ne di destê tu kesî de ye. Azadî serbestiya me, bi himet û xebata me çêdibe, ne bi destê tu kesî.

Emê girara ko çêdikin bixwin; heke me pir xwê xistîyê, girar çor bibe, heke me bala xwe ne da, wê bigewite.

Dewletên Ewripayê ên hevalbend tevde, çî biçûk, çî mezin û Emerîka, bi fidakariyên mezin, gihane derexa xwe a fro, î bilind û heja û bi kitêb, xwendegah, kovar û rojnameyan; rîya xebatê pêg me kirine; ev in hoste û mamosteyên me ên hinerwer û qedirgiran.

Kaniya zanî û sinhetê, bi destê wan vebûye; çira û ronîya xweşt û insanîyete wê vextîstîye.

Îro jî, di rîya heq û edalet û azadî û serbestiya dinyayê de, ew xwîna xwe direjînin, ji bona qenciya cihanê her fidakariyê dikin.

Divê em, mîna zaroyên aqil, zaroyên ko jî mela û mamosteyên xwe hez dikin, û qedrê wan digirin, li wan binêrin; û ji wan belîmin, mîna wan bikin, ji xwe çiqas xweş e ko di nav beyna me û wan de mirovatî heye; em jî mîna wan arî ne, zimanê me û wan jî kaniyek e, û ko sibe em jî elimîne û em jî bi xebata xwe pêg ve ketine, emê bibin mîna wan, eqil û dilê me, de bibe mîna wan, exlaq û pakiya wicdanê me, de bibe weke wan; bi xebata xwe, bi xeyret û xisletên xwe ên guzde, di welatê rohelatê navîn de, wê bibin çewq û ronahiyek, mîna welatek ji yê Ewripayê; herwekî ewripayê heja gotine: mîna Sûrîyaya Asyaya Nîzing.

## BER BI SERFIRAZIYE VE

LONDRE— Refên britanî û amerîkanî bi şev û bi ro, dirêjî hejagehên axa elemana, erdên vegirtî û yê Romanya û Mecarîstanê dikin.

Duht 2.000 belafîrên Hevalbendan di ser erdê Frensa vegirtî re firiyane û li batafirgehên elemana ko di vî erdî de hatine danin, û rê û rêhesinan xistine.

250 Kelehên Firok û 500 nêçîrvan têkilî êrîşa yekemîn bûne, di êrîşa diwemîn de 300 Liberators di penaha nêçîrvanên Spîtfeyîr û Then derbolstan de, zor dane hejagehên neyaran.

LONDRE— Êdî, eleman qaîl in ko di nav wan rojan de, eniya diwemîn de vebe, û qiwetên Hevalbendan ên mezin êrîşt erdê Ewripayê bikin. Ji aliyê din eleman cengkeştîyên xwe xistine derên ko li gora wan, Hevalbend pê li erdê Ewripayê bikin.

## LI ENIYA SOVYETI

LONDRE— Di eniya rûsî de, şerîne mezin hej destpê ne kirine, her çend jî eleman dibêjin ko di Jasiyê de, qirîne zor û xwindar, çêdibin.

Serfermandariya sovyetî qiwetîne mezin û taze tîne qada şerî û tete bawer kirin ko êrîşa rûsî a nû, û eniya diwemîn- di gawekê de çêbibe; bi vî awayî tiştê ko generalên elemanî, jê ditirsîyan, wê çêbibe; şer di du enîyan de. Heta fro, eleman jî tîrsa êrîşa Hevalbendan, erdê Ewripayê, 60 firçe esker û bihezaran top û tangên xwe li Ewriya Ro avayî hiştî bûn. Lê niho dema êrîşa mezin nîzing dihe û agir jî du alîyan dora ordiyên elemana bigire.

LONDRE— Civanê serekwezîrên erdê Kîşwerê Britanî, yê Ewis İralya, Nû— zelanda, Kenada, Efrîqa Nîroyî û Rodezya Nîroyî di bin serekîya wezîrê Britanya Mezin ê yekemîn, Mr. Çorçîl de, dom dike.

MOSKÛ— Leşkerên sovyetî di erdê Çekoslovakayê de, li palên çiyayên Kerpatê şerê elemana dikin; û yekîneyên sovyetî di nîro—ro helatê Stanislavê de, du asêgeh standine, û hêşîr girtine.

Stokholm— Li gora nûçeyên ko jî Moskoyê tîne, di eniya rûsî a navîn de, şerîne mezin, ber bi destpêkirinê ne.

BERN— Danezana rûmanî dibêje: di eniya rohelatê de, rewîşa eskerî ne guherîye.

WEÛNGTON— Wezareta emerîkanî a behrî dide zanî: noqavên emerîkanî di Pesîfîkê de, 12 gemiyên japonî binav kirine, tê de qirwa zoreke sivik, 2 destriyoy, banzîna kêşeke mezin, waporeke gir a arkariyê, 2 gemiyên eskerkêş, 5 waporên barkêş hene.

Ji despêka şerî û heta fro, noqavên emerîkanî 695 waporên japonî xeriqandine an çêkandine.

## GOTARA WEZÎRÊ DERVEKARIYÊ M. İDİN

LONDRE. — Wezîrê britanî ê dervekarîyê Mr. İdin, di pêşiya Civatmîletê Britanî de, elam daye ko Britanya Mezin û Spanya li hev hatine û êdî Spanya jî ma'dena wolframê—eleman jî bona çêkirina çek û posatan gelek hewcedarî ve ma'denê ne— hindîk de bişîne elemana, û hin waporên ko di benderên Spanyayê de ne, serbest bihêle.

Firçeya spanî Heşîn, ya ko di eniya sovyetî de bû, hatiye bi şûnda kişandin û vegeriya Spanyayê. Êdî Britanya Mezin û Emerîka, jî nû ve, pêtról bişînin Spanyayê. Mr. İdin gava qala vê lihev hatinê dikir, di xweşiya xwe elaman da.

LONDRE. — Li gora nûçeyên dawîn Ordîyên Yugoslavî yê xelasiya welêt niho di erdê Ewîstriyayê de şerê dijîmina dikin; û wan Koruskayê de, qiweteke elemanî perîşan kirine. Yugoslava ji aliyê din didin zanî ko di axa İstriyê de û li dora Trîsteyê jî, êrîşeke Yugoslavî; û di Mekîdonayê de jî, êrîşeke eleman—bilzarî çêkandine...

Niho, emê bidin eqilê xwe, Kurdistanê xweş bizane. Gelo mîletên Ewripayê bi xwe çawan gihane serbestî û azahiya xwe û çawan zehf mîletên dinyayê, ji nezaniyê xelas kirine û gihandine, mertebeyîne bilind, devê deriyê xweşt û kamiraniyê. Berî her tiştî divê emê bi hemî qiwetên xwe bixebitîn da ko xelê me, ji qe neve hînfî xwendina zimanê xwe bibin û bikarin kitêb, kovar û rojnameyên xwe bixwînin û karê welatê xwe xweş nas bikin; bê ko xelê îşê welatê xwe bizanin, nikarin bikêrî wî bîn.

Ji aliyê din, divê dinyayê bi pîrsa Kurdistanê bihesê; da'wa Kurdistanê xweş bizane.

Heke xelkê me bi tevayî û bi îsul û rêz û rêzikan, da'wa welêt seh kirin û ji cihanê re jî dane seh kirin, ev jî bona heyîn û hebûn û pêşiya me karekî zehf heja û qî-medar e.

Pîştî şerê mezin î kevîn, rîya xelase di pêşiya me de, vebû bû, lê me nizaniyê bû, îşê welatê xwe pêg ve bajon.

Bê şik jî bona azadî û serbestiya xwîn tete rijandin. Lê heke mîletek bi tevayî, îşê welatê xwe nas ne kir, ev xwîna ko hatiye rijandin, bê feyde diçe, û mîlet, bê ko tiştêkî heja bixê destê xwe, dikeve perîşaniyê.

## ŞIN

### Heçî Derwêşê Heçî Mûsa

Serekê Ezîzan, apê me î delal û heja, Heçî Derwêşê Heçî Mûsa, çû rehmetê.

Rehmetî, di sala 1870 de, li gundê xwe Qeremane, hatiye dinyê; hej, xort û ciwan di hate pêg cavan; mirovekî jîr, merd, ciwanmerd, bi aqil, dîndar, hazîrcewab û gelekî dilbirehîm bû.

Di sala 1918 de, gelekî nan, xwarin da alemê û feqr û belengazan.

Di wê salê de, li her aliyên dinyayê, gemî, çeh û her tiştên xwarinê buha bûbûn.

Di wê sala giran û buha de olçek gemî, bi çar zêrên zer di hate firotin.

Gelek axa û dewlê-menda berê xwe jî xelkê feqr û belengazan guhartî bûn, konên xwe di nependîyan û cihên dîr de vegirtî bûn.

Ewî konê xwe, li berya Mêrdîne, li navrokê Ewdu- Selamê vegirtî bû; rojê pê de, 100 — 150 nefes, li mala wî nan dixwarin; derê konê wî, bi şev û roj vekirî bû; qedrê xerfê û ciwanêran, gelekî digirt; pîr xerzîbost bû.

Rehmetî, gelek sarî û germiyên dinyayê, derbas kiri bû. Di sala 1912 û 1914 de, li Edîrnê û li eniya Romelîyê û li ya Qefqasyê, û di deşta Pasîfîkê de, di şerên Belqan û; ê Mezin de xerf kiri bû.

Di eşîra Kîkan de, ew zabîte qebîla xwe Ezîzan bû; û di sala 1906 de, ji bona te'mîna esayîş, emniyet û parastîna rîya Hicazê, ji « Reşîkên Ereban » bi İbrahîm Paşayê mîll re, çû bû, gîhaştî bû Şamê; ji bona ko biçîwa Medîna Munewer, di vî gavê de, Sîltan Ebdîlhemîd, ji textê xwe ket û Reşad rabû ser text; « Huriyet » serbestî îlan bû, derhal fermana İbrahîm Paşayê rabû, ji şamê heya Wêranşarê bû şer piştî vî şer, rehmetî vegeriya mala xwe.

Berê van tiştên tarîxî û dîroki di sala 1895 de, di şerên İbrahîm Paşayê û Farîs— Cerba û Hadiyê kurê Asî û di şerê Kîkan û Husênê Qenco de jî, şer kiri bû.

Di sala 1890 de, di dest pêka teqîlata alayên Hemîdiyê de, ew bû bû zabît, di eskeriyê de, rûta wî milazîmê ewil bû; di destê wî de, ji Wezareta şerî morkirî kaxe zên resmî jî hebûn.

Di şerê Belqana de, li Stanbolê li pêş wezîrê şerî û li pêş, heçî mirovên mezin, jî wî pê ve kes ne diaxivî.

Di sala 1926 de, piştî ko qomandan Tirya hate Cîzîrê, di sulbê eşîrên Kîkan û Mîlan de, roletkî mezin listî bû.

Tirya gelekî jî wî hez û ew teqdîr kirî bû.

Ji her du eşîran, gelek axa û serek hebûn; di vî silhê de, Tirya jî wî pîr memnûn û dilxweş ma bû; ji axayên din digirtî tîbî; ew

# DEMA NIHA

WESINGTON — Rojnama rûsi Pravda dinivise : West e ko di Ewripa Roavayî de êrîşa mezin destpê bike. Ingilistan û Emerkayê de delêletin girane hêne ko kar û barên eskerî ên mezin pêk tîn, lê hazir kirina her tiştî, hewcedarî wextê e.

WESINGTON — Stola emerikanî jî nû ve li ser girava Trukê de girtiye, der Behra Pesifikê, û hêjagehên vê erdê daye ber agirê xwe. Zirehpêş, qirwazor, belafir hilgir, destriyoy û cengkeştiyên emerikanî ên din tekiilî vê êrîşê bûne, 126 belafirên japonî hatine avêtin erdê. Bombeavêjên emerikanî jî girava Wêkê daye ber bomban.

NÛ — DELHÎ — Li gora nûçeyên dawîn qiwetên japonî di bakurê Honanê de pêş ve dikevin: li nîro û nîro roavayê Sang - Sayê de jî, ew ber ve hatine.

MELBURN — Leşkerên ewistralî yê ko ev çend rojin Madang û Aleksishafen vegirti bûn, niho ber bi hindurê ve dimeşin. Qiwetên emerikanî jî, yê ko pê li erdê Holandiyayê kiri bûn pêş ve tîn. Heta niha di Holandiyavê de 700 japonî hatine kuştin.

WESINGTON — M. Stetinus ji Londrê hatiye erdên Efrîqa Bakurî.

## 33 TON BOMBE

LONDRE — Meha borî refên bîrlanî 33.000 ton bombe avêtine hêjagehên axa elemana û yê erdên vegirti.

LONDRE — General Mek Léan, zabîte girêdanê li ba gerargeha Meraşal Tito, bi kardariya yugoslavi ve, vegeyriyaye Londrê.

WESINGTON — Noçavên emerikanî di behrên Rohelatê Dûr de 12 gemiyên japonî binav kirine.

MOSKÛ — Qiwetên sovyetî 160 kemyon û girgirok 6 deboxaneyên banzîne, trêneke eskerî jî 50 wagonan bihevkefî xira kirine.

Di Behra Reş de, refên sor bi ser qeşewaporekê de girtiç ya ko berê xwe da hû peravên Romanyayê. Gemiyeye dijmin a parastina peravan, du barkêş û waporekê 800 ton mezin hatine xeriqandin.

STANBOL — Efrê japona li Romayê hatiye Enqerê; ev diçe wêlê xwe, tete gotin ko yekî din de bikeve çûna wî.

## SIN

- 2 -

ra wan tişteki eqil û mentiqî nişan ne didan; di îşê silûê de, gelekî bi ekî peyivî bûn.

Di sala 1939 de, generalekî fransîzî hate Derbasiyê; di îstîqbala wî de, bi hezaran xelk civiya bûn di rohilatê bajer de, li pêş wî, bi navê eşiran, gotarekê kin, lê hêja wî da.

Wî, di gotara xwe de got: em bi dil û canê xwe serfiraziya he valbandan dixwazin, di xizmeta wan de, her gav emî hazir in.

Di zemanê Hukûmeta mandatêr de, welatê me ava bû; jî xeta «rêhesinê» û heta çiyayê Evdilezîzê tev de, bûye gund û abadan; di tu wexta de, ev qas emniyet ne keti bû wî erdî, ev welat daim cinê xezî û talana bu; emniyet û avayî lê tune bû, iro bi saya Hukûmetê, bi hezaran gund ava bûne; Frense diya huriyet û serbestiyê ye; serbestî jî Frensayê li dinyayê, belav bû ye. H. p.

General jê re spas kir, xelkê li çepilkan xistin.

Di sala 1937 de, di hadisa Amudê de, ne ew biwa, li Derbasiyê, wîqatîne mezin, wê çêbûbiwa. Ji xwe, berî mesela hadisa Amudê xelkê digot; ko li Derbasiyê tişteki mezin de çêbû.

Spas ji Xwedê re, bi himeta rehmetiyê ilahî Dewrêş, tişteki çêbû; bi eqil û tevdînen xwe ên nekîma ne li xelkê şeret kir.

Ji Cenevê, ji Cavata Miletan, ji Komîta Mandan, ji wî re mektûbek hat, tê de, te yida wî dihatê kirin.

Bi rastî bavê smaî û Sulêman ne stêlên bu; Xwedê rehna xwe lê bike.

Amudê: Gir - Dêwan - Elemdar

## DE LO LO

Ez bi çiyayê Kurdaşî ketim, li derê Wanê;

Ez bala xwe didimê ezmana, tê gurê gurê teyara, û erdê tîyl dengê topa û mitralyoza û cebîlxana.

Şêx Mehmûd sê denga ban kirî, Kerîmê Fetah beg:

Ji milê dijmina, destê xwe bavêj ser darê canbêzara û mêr bin mêrxas bin, dest hilfinin.

Bi ser me dihat, misteşarê Kerkûkê, û Silêmaniyê.

De lo lo, Şêxê min, şade şihûdê şêx Mehmûd, şêxê zirav, bavê Letif, kekê şêx Qadir gelek hene... Şerekî giran diqewimî, li çiyayê Kurdaşî, wa li ber e.

Ordiya nizama ingilîz giran e, bi top û cebîlxana ve, kişiya ye û lhatiyê ser e.

Gelik şahid û şihûdê şêx Mehmûd, kekê şêx Qadir, bavê Letif hene. Bi sê denga ban dikirî Kerîmê Fetah beg, bi gellê eşîrê Kurdistanê ve. Bavê min mêrê çê bin û çê bixebitin.

Qayîşê tîfinga li destê xwe bi gerînin, çavê xwe bidin ber nişanê. Ez hewar dikim, hewara kurdên Tirkistanê dîr in û kurdên dora me xain in.

Şerekî giran diqewimî li çiyayê Kurdaşî, li derê malê.

Hespê şêx Mehmûd, kekê şêx Qadir, bavê Letif.

Îro sê roj in dikeve pîkolê, şêx Mehmûd ban dikirî Selîmê Fetah begî, bavê min o mêrê çê bin, zorê bidin ordiya ingilîz.

Îro sê roj in gerê me di beriyê de xweş bûye,

Bila roja çara têkeve kolanê aliyê çolê

Ez xiyal û bala xwe didimê, li hewa xweş tê vir — rênê teyara, pelqinê mitralyoza.

Li erdan xweş tê qajeqaja nobetdarên...

# MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER U ASITTIYE

## HINIK BIHAR & BIHIN



Kofi, Xeftan, Cil û Delaliya Dot û jinên Ewripayê.

MOSKÛ — Serfermandariya sovyetî duhî êvarê danezana jêrin balav kiriye: di tevayiya eniyên şerî de rewîşa eskerî bi awakî hêja ne şuhariye.

Li 1 — ê gulânê, qiwetên me 20 tang û 36 balafirên elemani xira kirine. Şeva di refên me ên dîrger gehneka rêhesinan a Lwowê dane ber agirê xwe; zehf trênan derbine dijar xwarine; cih bi cih agir bi vê erdê ketiye û 30 şewat çêbûye, 7 şewatên mezin; du û pêtiyên wan şewatan 2.000 mêtir bilind dibûn; 12 teqandinine giran çêbûne. Me-kînyên me bi tevayî vegeyriyane warê xwe.

# LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabet  
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE

Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement  
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

## KURDISTAN

La Question d'Orient — qui pendant longtemps, a été simplement la Question de l'Empire Ottoman — ne pourra être considérée comme résolue tant que se posera la Question Kurde. Les négociateurs des traités de paix, après la guerre 14-18, avaient-ils donc oublié les Kurdes? Nullement. Le Traité de Sévres, au chapitre Kurdistan, dans les articles 62, 63 et 64, prévoit la création d'un Kurdistan uni et autonome. Les signataires turcs du Traité, renonçant à tous droits et titres sur les territoires à population kurde, admettaient le principe de l'indépendance kurde. Aux termes de ce Traité, l'union des Kurdes du Sud et du Nord devait être réalisée.

Mais, après la victoire kémaliste sur les Grecs, à la faveur de la lassitude des Alliés, le plan de création d'un Kurdistan a été remplacé par des combinaisons politiques, imposées par la force, qui, méconnaissant le droit des Kurdes à bénéficier des principes wilsoniens, partageaient leur territoire entre plusieurs états.

La Turquie conservait la partie du Kurdistan comprise dans les anciens vilayets d'Ourfa, de Malatya, de Kharpout, d'Erzeroum, de Van, de Bitlis, de Dyarbékir, de Hakkari, contenant une population kurde qui, aujourd'hui, peut être estimée à plus de quatre millions.

La Perse gardait la province qui porte le nom de Kurdistan celles de Kirmanchahan, du Louristan, du Pocht Kouh et le pays Bakhtiyar, avec une population de trois millions et demi de Kurdes.

L'Iraq recevait tout le territoire de Mossoul et de Kirkouk et le pays qui, loin au delà de Souleimaniye, s'étend jusqu'aux confins du Kurdistan du Sud, avec une population de plus d'un million de Kurdes.

La Syrie, avec la Djeziré, le Kurd Dagh et la région à l'Est de l'Euphrate, se voyait attribuer un territoire habité par environ 250.000 Kurdes.

Enfin, l'URSS gardait dans ses frontières un petit groupement kurde, environ 160.000 âmes.

On voit donc que, situé en plein coeur de l'Asie Mineure, le Bloc Kurde occupe la plus grande partie de la région montagneuse qui s'étend entre la Mer Noire et les steppes de Mésopotamie, d'une part, l'Anti-Taurus et le plateau iranien, de l'autre.

Le partage du Kurdistan a été créé, dans plusieurs des états qui en bénéficiaient, de puissants groupes minoritaires kurdes. La Question Kurde, loin d'être liquidée, s'est multipliée.

Le sort de ces minorités n'était pas partout le même. En Syrie et en Irak, sous la protection des

Puissances Mandataires française et britannique, et en URSS, certaines possibilités de développement culturel et économique leur était laissées. Le cas était tout autre en Turquie et en Perse, où des régimes d'oppression s'efforçaient en vain de supprimer la question kurde par l'assimilation forcée, les déportations et les massacres.

Mais les échos des révoltes kurdes de 1925, 1926, 1930 et 1937 révélaient au monde que la Turquie, malgré le démembrement de l'Empire Ottoman, n'était pas devenue un pays à population turque homogène. De même, des révoltes en Perse et en Irak rappelaient que la question kurde attendait encore sa solution. Les problèmes intérieurs soulevés par les minorités kurdes devenaient le principal souci de ces états qui, dans le Traité de Saadabad, s'entendaient sur les mesures à prendre pour étouffer tout mouvement national kurde.

Pour illustrer le vrai caractère des mesures de répression dont furent l'objet les Kurdes, remarquons qu'il s'agissait, presque toujours, d'interdire aux Kurdes l'exercice de leurs droits les plus élémentaires, celui d'avoir leurs écoles, celui de parler leur langue, celui de chanter leurs chansons. Certes, les aspirations kurdes ont souvent été présentées sous un autre jour : d'après les Turcs, les Kurdes « rebelles » étaient opposés à tout progrès et combattaient les mesures visant à leur apporter le bien-être ; il leur déplaisait de voir introduire chez eux un ordre nouveau qui mettrait fin à leur genre de vie brutal. Pourtant, les Turcs se rendaient parfaitement compte du vrai caractère de la lutte. Après la révolte de 1925-26, au cours de laquelle les patriotes Kurdes tinrent longtemps en échec de nombreux corps d'armée turcs, le tribunal spécial turc qui siégeait à Dyarbékir et qui a condamné à mort 800 Kurdes (parmi eux de nombreux intellectuels), disait dans son jugement : « Certains d'entre vous ont pris pour prétexte de révolte, les abus administratifs du gouvernement, d'autres ont invoqué la défense du califat, mais, vous tous, vous n'aviez qu'une seule idée, celle de créer un Kurdistan indépendant. Vous le payerez de votre vie. »

En 1930, pendant la révolte de l'Ararat, le député turc Yakoub Kadri, un écrivain connu, signait un article où on pouvait lire : « Ce que signifient les flammes rouges de ces batailles, ce n'est pas la fin, mais le commencement d'une lutte entre deux races : la race kurde, que les Européens considèrent comme étant des Aryens

comme eux et la race turque qu'ils considèrent comme des Mongols. « Dans un journal turc de la même époque, on pouvait voir un dessin représentant un tombeau placé au sommet du Mont Ararat, portant l'inscription : « Ci-gît l'illusion de l'indépendance kurde ».

Non, il ne s'agissait pas d'une lutte des Kurdes contre le progrès et le bien-être. Il ne pouvait non plus être question, pour les massacres des Arméniens, de réprimer la brutalité des rudes montagnards kurdes : On peut lire, à la page 47 du rapport sur la dispute au sujet du Vilayet de Mossoul de la Commission de la Ligue des Nations : « Nous avons pu établir le fait que, de tous les peuples musulmans, ce sont les Kurdes qui entretiennent avec les Chrétiens les relations les plus amicales ».

En Perse, où le gouvernement ne disposait pas de moyens militaires aussi puissants que ceux des Turcs, on attirait les chefs kurdes hors de leur territoire, soit par des invitations personnelles du Chah, soit par des promesses d'amnistie ; ensuite on les jetait en prison ou on les tuait.

La liste des souffrances des Kurdes, au cours des deux dernières décades, est longue. Elle illustre le paroxysme d'une politique traditionnelle des Empires Ottoman et Persan. Il peut sembler paradoxal que ce soit à notre époque que les Kurdes aient dû subir les persécutions les plus brutales de leur histoire. Mais l'explication est simple : Dans un monde qui, en théorie, après la guerre 14-18, reconnaissait les droits nationaux des peuples, après le Traité de Sévres qui avait ranimé la conscience nationale kurde, les Turcs et les Persans n'ont pas trouvé d'autre solution à la Question Kurde que celle qui consistait à faire une dernière tentative pour la supprimer, tentative brutale et désespérée que seuls le courage et la ténacité kurdes ont pu mettre en échec.

La guerre actuelle a mis en oeuvre un faisceau de forces sans précédent dans l'histoire, unies dans le désir de faire régner la justice dans le monde. Le régime d'injustice et l'appareil militaire formidable de l'Allemagne hitlérienne ont suscité la réaction du Monde Libre. Mais la justice est une et indivisible. Les crimes commis à l'égard des Chinois et des Ethiopiens étaient à la racine de la série d'abus qui a abouti au conflit actuel. Le monde de demain ne permettra pas que des foyers d'injustice subsistent, où que ce soit ; il n'oubliera pas la Question Kurde, et il ne se laissera pas intimider, comme en 1922. Tous les voisins des Kurdes ont leurs foyers nationaux : les Turcs, les Arabes, les Persans, les Arméniens les Kurdes auront le leur. Et il est difficile de prétendre qu'en

tant les territoires kurdes aux états qui se partagent le Kurdistan, on dérangera un ordre bien établi. Ces états sont en pleine évolution ; ce sera leur rendre un grand service que de les débarrasser de leurs plus fortes minorités et de leur permettre de se consacrer à leur progrès culturel, social et économique, au lieu de songer à s'assimiler par la force des éléments irréductiblement étrangers.

Le Kurdistan est riche. Ces richesses, dans un Kurdistan morcelé, restent en friche : Quel est le gouvernement qui se soucie du développement d'une province ou coupe perpétuellement la révolte ?

Le Bloc Kurde, habité par une population homogène, deviendra un élément de stabilité et une source de prospérité pour le Moyen-Orient. Les richesses agricoles du Kurdistan sont connues ; paysan incomparable, le Kurde devenu libre donnera toute sa mesure. Les richesses du sous-sol kurde sont moins connues, quoi que certaines de celles-ci, notamment le pétrole, soient exploitées sans que le monde se rende compte qu'il s'agit d'une richesse kurde dont le peuple kurde ne profite pas. Mais il faut le dire : Les fameux puits de pétrole de Kirkouk (Irak), de Kirmanchah (Perse), les gisements de Sirt (Turquie) sont situés en territoire kurde et font partie du patrimoine national kurde. Les Kurdes désirent mettre leur pays en valeur, le monde entier en bénéficiera ; mais il est inadmissible que les richesses kurdes soient exploitées sans que le peuple kurde ait son mot à dire.

Lorsque, après l'autre guerre la Question Kurde a été posée aux signataires du Traité de Sévres, ils y ont répondu par la création d'un Kurdistan indépendant. Malheureusement, alors, les conclusions théoriques des organisateurs de la paix ont été mises en échec par l'emploi de la force. L'état d'esprit des Nations Unies, dans le conflit actuel, offre de toutes autres perspectives. S'inspirant des leçons du passé, les traités de paix ne seront pas le résultat de marchandages et ils ne seront pas modifiés par des coups de forces. La capitulation sans conditions des forces d'oppression : c'est sous ce signe que se régleront toutes les questions internationales. La justice sera étayée par la force. Sans ambiguïté, les nations-Unies ont annoncé leur intention de faire respecter les droits nationaux de tous les peuples.

La politique libérale des Français et des Anglais dans les parties du Kurdistan qui se trouvaient sous leur mandat, les traditions du peuple américain, la présence, aux négociations interalliées d'après-guerre, d'un gigantesque facteur nouveau, l'URSS — apôtre de l'autonomie nationale des peuples —, sont autant de garanties d'une solution définitive de la Question Kurde, par la création d'un Kurdistan indépendant.

STRANA KURDÎ

WAY LO

Way lo, way lo, ma'qulo romî hebe, axa o romî!

Mi di tavê dabû ser Xelokê Diwanze rima tav hilatin, kula Şamê tu ê bi kul bi,

Tekevî mala qeymeqamê Ko pê Ehmedê Berazî.

Çawîş û cenderimê vê xelatê Çawa bi dû bavê Ferid, xaçerêka Wanê kirine ta'qîbê ta'qîbatê...

Axayê mi wia na be, ma'qulê mi, wia na be;

Îrada ko li ezmanê jorin hati be nivisandin, li erda betal na be!

Heta fesadiya me kirmanca

Kes ji ma'qulan û ji axeleran li ser rûkê dinyayê xelas na be... gerekî dibû di geliyê Kesê, li Axpinê.

Izet tu ê bavê xalê xwe, tu ê destê xwe bavê heqîbê. Tu ê ji xalê xwe re bîni dorbîni.

Ezê geliyê Kesê ji teresê romî bikim qesabxana gola xwî nê

Axa o wia nabe, ma'qulo wia na be.

Îrada ko li ezmanê jorin hati be nivisandin, li erdê betal na be!

QEMERZEMAN

- 2 -

Rokê ji hev re gotin: emê fro li mal bin, qonaxê bavê me mezin in, emê bifericin ji xwe re. Ji xwe re digerin di qonaxê bavê xwe de, li daîra, li oda, diwanxana digerin, heyani ko aciz bûn; Gihane Odakê du kursî di wê Odê de bûn; her yekî li ser kursîkê rûniştin.

Pişta xwe dan diwêr, li miqabilên xwe nêrîn sûretê qizekê, bi diwêr ve ye. Hişê Qemerzeman çû dinyakê din. Dilê wî eşiya. Şer wiha lê nêrî, ko Qemerzeman li tenişta wî ketiye, Şer ji xwe re got: wê bavê mi ji mi re wê bêje te kustiye lawê min! Rahîştîyê, û av li ser çavê wî kir û jê re got: çî bi te hatiye; nikarî hiştîkîle.

Pişti saetekê hişê wî hate serê wî û jê re got:

Ma tu na nêrî, li vê sûreta ha, ko bi diwêr ve ye.

Şer jê re go: ev çî sûret e?

Go: sûretê qizekê ye.

Sûret anîn ba xwe û lê nêrin, ko li bin sûret nivisandiye navê qizî kê Gulî Pemba ye, kêçka hakimê Sisibanê ye. Şer jê re got:

Tu zani emê çî bikin, sibehê emê herin neçirê, emê bedlek cilê zêde, her yekî ji xwe re bibin, xurçikê xwe tje pera bikin û emê herin.

Li riya xwe, emê xezalekê an kêvroşkekê bikujin, xwîna wê li wan çîna zêde xînin, biçirînin, bavêjn ser bira şêra, wê ehlê me bi du me de ben, li me digerin, wê van çîna mînim, we ji xwe re bêjin, şêra ew xwarine; û emê herin di dinyayê de; heyani ko em vê qizikê neyin, xwedîya sûret, em nayin.

Qemerzeman go: ê baş e, raya te xweş e.

Sibehê rabun, wilo kirin û bi dinyayê de çûn.

Piştu sê rojan, ehlê wan li wan gerîyan, çûn ser Bira Şêra û diîtin çîle wan û wê derê, çiriyane; û gotin: şêra ev zarî xwarine.

Qemerzeman û şer bi dinyayê de çûn; du meha gerîyan, gihan bajarê Sisibanê.

Çûn mala pîrekê feqîr û ixtiyar bûne mêvan.

Ji pîrê re gotin; êvara te bi xerî tu mêvana na hewînî?

Pîrê ji wan re got: mala min piçûk e, tiştîkî min tune, ne hon tede razin û ne tiştîkî ko hon bi xwîn, ma ezê çawa we bihewînim.

Qemerzeman destê xwe xiste pêrîka xwe, kulmek zêr derxist da

pîrê go: îşev emê li mala te razên.

Gava pîrê çav bi zêra ketiye, û got lawo mala min, mala mêvana ye, lê rûyê salê reş be.

Pîrê çû du bedil lihêf anîn û xwarin ji wan re çêkir; xwarina xwe xwarin gotin pîrê: sur bi te re heyê an tune ye?

An pîrê ji wan re got: sura min wek behrê ye.

Jê re gotin: em hatine Gulî Pemba; emê çawan xwe bigehîninê?

Pîrê ji wan re got: ji roja Gulî Pemba çêbûye, ez wêna xwedî dikim, diya xwe nas na ke, mi nas dike.

Belê fro heftik «heft roj» ez jê xeyidî me, ji bona xatirê we ezê sibehê herim cem wêna; û îşalle, we bigihînim hev.

Sibehê pîrê çû çarçiyê ji xwe re çarçefek kirî, çimikê kirî, he bik hene anî mal, hena xwe li porê xwe danî, çerçefa xwe li xwe kir, xwe pir temiz kir, qesda mala Gulî Pemba kir; gihast ber deriyê wan, nobetê li ber deriyê wan hene; ne hiştin ko pîrê here cem keçik.

Pîrê ji wan re got: ev çî ecêb e, ko hon na hêlin, ezê herim cem keçka xwe.

Li dengê wê keçikê ji jor bi hist, ban wana kir go: bela bel.

Keçikê jê re got:

Ya pîrê çîma tu ji min xeyidî ye.

Pîrê jê re got:

Ez ji te ne xeyidî me, belê fro heft roj, du lawê me hebûn, isal bîst salê wan wînda bû bûn, ne xuya bûn, hatin; û destê min ji wan ne dibû, fro ez vala bûme, ez hatim cem te.

Keçikê jê re got:

Ya pîra delal, ev çend salê te, tu li cem min î, te rojekê ji min re ne got lawê min hene, fro çî ye tu bi fena hatiye, tu dibêjî lawê min hene.

Ez zanim meqseda te çî ye! rast ji mi re bêje, bê ev çî kesik in, li cem te.


Pîrê jê re got:

Du xort in, lawê hakimane. yek jê re dibêjin Qemerzeman û yekê re dibêjin Şer; ji welatê xwe hatine ji bona te.

Keçikê jê re got: baş e, mi qebûl kir, belê tu zani, ko çî qeyse xelk, hakim û axe tèn min dixwazin û ez dibêjim ez mîra na kim; ji bona xatirê te, ko te ta' b bi mi re dîtiye, mi wan xorta qebûl kir, de here mal û ê ko ji wana ez dibêjim, bela bê nav bexçê bavê min

PÊJINÂN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdestî



Ji Bergehên Kurdistanê : Dergeh, Ayîn û Zar û Zeçên Brayên Me Ên Delal Ezedî.

bi şev, ezê herim cem û ezê lê bi-nêrim; pîrê jê re got; baş e. Pîrê vegeriya hat mal, şer jê re got: hê pîrê te çawan kir, pîrê jê re got: min keçik razî kiriyê; bela êvarê Qemerzeman her nav bexçê bavê wê; keçik wê bê cem wî, wê hevdu bibînin,

Êvarê pîrê rabû, fanûsekê b-xwe re hilanî, û da pêşiya Qemerzeman; gihande nav bexçeyê hakim û jê re got: de li vê derê be... Pîrê vegeriya çû mal, Qemerzeman ma li nav bexçê; ji xwe re dirê û tê.

-- ne qediyaye --